

# Azadîa rastî çi ye?

Miruv li gel êk u dû ‘turre dibit ji ber têgehiştina xelet yan çunku divêt kirîarêt miruvêt di biguhurrin. Xêzan u binemale li gel êk u dû ji ber hevirkîet kevîn şerrî dikinheta ew nezanin mebesta wê hevirkîet çi ye, belê ew berdawamin li ser şerrî. Eve ne baş e u pêtivî ye birawestîn.

Şerr u hevirkîet dinav we da ji kêrê ne? Ma eve ne ji hewesêt we yê xirab in ku yê gîanê we şerrî dikin? Çavê we li tiştêkî ye, belê hîn bi dest naxin. Hîn dikujin u çavê we lê ye, belê hîn ne şên bigehine armancê xû. Hîn şerr u hevirkîet dikin. Hîn bi dest naxin, çunku hîn ji xû dê naxazin. Hîn dixazin u wernagirin, çunku hîn bi inîeta xirab dixazin, da hîn ji bu keyfê xû xerc bikin u kar bînin.

Êk tişt dirist e: em ne şên miruvêt di biguhurrin. Belê, Xwidê dişet dilêt miruva biguhurrit – u dilêt me jî.

Heker hîn ji êk u dû turre bin, bila pêtivî ye husa bikin:

- Pêtivî ye em guhê xû bidîn êk u dû da em bizanîn ka her êk ji me çi divêt. Bila pêtivî ye em pişîara bikîn u tê bigehîn.
- Bu wî miruvî du’a bikin u ji Xwidê bixazin dilê wî nerim bibit da kirîarîa wî bu we rast u berêz bit bi taybetî nik Xwidê.
- Digel êk u dû biaxivin u pişîara bikin u derfetê bidîn her kesekê bîr u buçûna xû bidit u dijîatîa xû run bikit da em bişên ji êk u dû fêr bîn. U gehîne êk armanc.

Heker we divêt azadîa rastî bigirin, pêtivî ye hîn heş bira u cîranê xû bikin. Wek Qabilî xirab ne bin yê birayê xû kuştî. Vêca buçî wî ew kuşt? Ji ber karê wî bi xû di xirab bîn, belê yê birayê wî di rast bîn. Her kesê kerrbêt wî ji birayê wî vebit, mêrkuj e. U hîn dizanin ku azadîa rastî u jîana heruher digel çi mêrkujekî nîne. Ne bi gutin u zimanî, belê bi kîrnê u rastîê heşêkîrnê bikin.

Bixazin ji Xwidê da hîn azad bin.

- Bixazin ji Xwidê harîkarîa we bikit u Gîana xû bidit we da di jur we bijît. Gîana Xwidê dê nîşa we dit çi rast e u çi xirab e.
- Li gel miruvêt xû bi rastî biaxivin.
- Mişkîlêt (arîşet) xû zî çare ser bikin, bila evruke da zî xilas bit u xirabtir lê ne êt. Heker hîn turre bin, bila gunneha ne kin. Ne hêlin roj ava bit u hîn heş turre ne. Derfetê ne din Iblîs!
- Bila peyveka pîs ji devê we ne derkevit, belê axiftina baş bu avakirna pêwîstî yê heye, da çakîê bidite guhdara.
- Li birayê xû biburin. Xû ji her kînekê u turrebînekê u çûnekê u civînekê u her çewtîekê bidin paş. U li gel êk u dû nerim bin, u dil nêzîk bin, u li êk u dû biburin her weku Xwidê ji ber ‘Îsayê Mesîhî li me diburit heker em gunnehêt xû aşkira bikîn.
- Dijî êk u dû ne axivin. Heker hîn dijî birayê xû biaxivin u wî gunnehbar bikin, ew dijî desturê diaxivin u desturê gunnehbar dikin. Heker hîn desturê gunnehbar bikin, hîn ne ewî yê desturê bi cih tînin, belê hîn li ser desturê dadwerin. Ewê desturê danaî u dad dîkit, bi tinê êk e, Xwidê ye. Ew dişet qurtal u helak bikit, her ewe. Vêca hîn kî ne da cîranê xû gunnehbar bikin?

Amujgarîa ‘Îsayê Mesîhî bu hevalêt wî eve bî:

“Heke birayê te gunneh digel te kir, bi tinê here nik wî gazînda jê bike. Heke guhê xû da te, te birayê xû bi destê xû ve îna. Heke guhê xû ne da te, êkê yan dûa digel xû bibe, daku <her tişt bi rêka dû yan sê şahde aşkira bibin>. Heke guhê xû ne da we, wê duzê bigehîne civata bawerdara u heke guhê xû ne da bawerdara jî, bila li nik te weku bê ul u bacgir bit. Bi rastî dibêjime we, heke dû ji we li ‘erdî li ser daxwazkê pêk hatin, daxwaza wan çi tişt bit, dê bu wan ji nik Babê min li esmana bicih êt. Çunku her cihekê dû yan sê bi navê min kumbîn, u ez dê dinav wan da bim.” – Mizgînî ya Mettî 18:15-17, 19-20